FIRÎN

Şahînê Bekirê Soreklî

Di pêşejiyana wî de hêviyekê di kûraniya dil de livandibû, hêviya ku bikaribe bifire. Rojekê dema ew bi bavê xwe re çûbû zozanan, çavên wî li bazekî azad ketibûn û wî bo hemî hestên di dilê zarokekî de xwe ber bi bazê li jor hildabû û ji Yezdanî tika kiribû ku wî jî bike teyrekî wek wî bazî.

Di dilê zarokî de roj li dû rojê meraq mezintir bû, meraqa bidestxistina du qanadên ku bikaribe bi wan xwe bigihîne hêviya xwe.

Di sibeha nîsaneke saleke bêjimar de pêriyeke ji çîrokên toreyîn yên rojhilatê xwe gîhand zarokê li ser girekî li ber berxan, lawikê ku nuha bû bû heft sal û gotê (Lo Azado! Lo Azado! Ha ji te re du qanadên pêriyan, were li gel min, em ê bi hev re bifirin lê tenê ji bo bîstekê) Zarok ket nav deryakeke şahiyê, ramûsanek wek diyarî da pêriyê û hew dît ew bûye bazekî azad, wek yê ku wî li gel bavê xwe dîtibû rojekê. Ew li asmanî fertiliya, bi pê-

riyê re firiya, bi rojê re keniya, û firiya û keniya û firiya ta ku serxweş bû di nav hesên bexteweriya xwe de û nema xwazt vegere lê da ku sozê xwe bi cîh bîne û pêriyê li vê kiryarê poşman neke vegera û li dû wendabûna wê giriya, lê dû re keniya, da logtikan û ber bi aso reviya. Êdî baş dizanibû kî dilê bi daxwaz dikare bigihê hêviyan; Û careke din keniya, ber bi aso reviya û keniya.

Ew xweşbûyera rojeke zarokiyê di beşekî dilê wî de ket gorê; û roj şevan xwe bi hev guhertin, û germahiyê bihar di nav havînê de heland, bayê payîzê germahiya havînê kujt û berf û barana zivistanê pelikên payîzê nimandin; û bi hatina bikareke din re erd dîsa xemilî û dar car din kesk bîn û pelikên nû dan hebûnê. Û biharek çû û yek hat, û sal û saldemên jiyanê dan dû hev, wek pêlên ava çemekî, û zarokê heft salîn bû, ciwanekî hevdeh salîn û ciwanê hevdeh salîn bû peyakî çel salîn û peyayê çel salîn bû pîremêrekî heftê salîn: Lo, Lo! Jiyan xewneke.

Rojeke ji wan rojên çiksayî, li kêleka ava Deryaya Aram, li welatekî pirr û pirr dûr, çavên wî li keçeke sê çar salîn ketin ku dixwar şekirekî ji wan şekirên bi darik û hat bîra wî yekemşekirê ku diya wî jê re li gundekî biçûk kirîbû ji etarekî.Dû re çavên wî li xortekî ketin ku bi ramûsanekê evîna xwe li ser lêvên ciwaneke bejnzirav mohr dikir, û hat bîra wî yekem evîna wî, yekem ramûsana wî, bişkifandina kulîlkên ciwaniya wî û hişbûna pelên dara bihara wî; û ji nişkan ve çavên wî li keweke deryayî ketin û hat bîra wî yekem firîna wî, û wî da xwe ku bifire lê ket xarê. Û careke din bizava firînê kir û careke din û yeke din, û hew dît canê wî ji giyanê wî vediqetêye, û can bû teyrekî baz, li asîmên firiya: Wey lo! wey lo! çawa xwen bi ber bayê felekê dikevin!.

Hinek li kêleka ava deryayê diqîriyan digotin pîremêrek şûna xwe de ket û mir: Wey rebene, bêxwediye, kalo! Lê canê pîremêr li jor dikeniya, difiriya, dikeniya û difiriya. Çiqa xweş bû azadbûna canî ji giyanekî pîr bûyî! û firîna wî domand ta ku gihîşt gundê ku diya wî jê re kirîbû ji etêr yekem şekirê wî. Lê canê wî di kûraniya xwe de êşiya dema dît ku ne gund êdî gûndê zarokiyê ye, ne jî ew zarokê gundî ye. Û pîremêrê baz bi daxwaz ber bi jor rabû ta ku wenda bû di nav ronahiya rojê de û bi tevahî di nav tîrêjên wê de heliya: Lo ! Lo! Xewn di nav xwenekê de bû xweneke din.

Di heman rojê de, li eynî gundî kurdistanî, zarokeke çar_ pênc salîn du perên bazekî li ser mitekî bejî dîtin, ew ji diya xwe re birin û gotê Dayê can min bazekî pîr dît, ber bi rojê firiya û va ne du perên ji wî ketinî. Dayê zarok hembêz kir, maç kir ji her du çavan û keniya. Û zaroka bi ramûsana evînê dilşad bûyî keniya û daya bi kenê keça xwe bextewer bûyî dîsa keniya, û nuha êdî xwerist jî bi wan re dikeniya; û bêyî kes pê bizanibe hêviya firînê ya zarokekî ku bi koçkirina pîremêrî re mir xwe nuha di nav dil û hişên zarokekê de vedijand.